

GAVA EM ŞEHÎDÊN KOMKUJÎ Û FERMANAN BI TIFAQÎ, DÎPLOMASÎ Û LOBIYAN BI BÎRNEYNIN, EWÊ BÊNE JI BÎRKIRIN

Weke gelek ji we xwandevaran dizanin û wexta ez jî bala xwe didime pêdivî, şîn, şayî, urf û adetên civaka me Kurd-Êzdiyan, ez dibînim gelek derfetên ku piştgirî, dîplomasî û lobiyên me xurt bikin hene. Wexta em van derfetan bi zanîn û rêxistinî nasbikin û wan di nav dîplomasî û lobiyên xwe de ji bo berjiwendiyên endam û saziyên civaka xwe bikarbinin, wê hingê komkuji, ferman û gelek pirsgrêkên civakên Kurdî ji bîrnebin, heta emê hinek zahmetiyên aborî çareser bikin û gelek birnan ji bi destên xwe bikewînin.

Ji ber vê jî dibêjim, li ser me endam û saziyên civaka Êzdiyan ferze, em derfetên ku tifaq, piştgirî, dîplomasî û lobiyên me xurt dikin baş nasbikin.

Ez jî gelek ji van cûrên çalekiyên dîplomasî û lobiyên nasnakim, lê ez dikarim niha ji we re bahsa çalakiyê ku di cî de piştgirî da **birîndarên Şengalê** bikim.

Kekê min Dawidê Bişar di 19.07.08 de daweta kurê xwe (binêren li wêneyan: Zave Erhan û bûk Zehra(keça Dawidê Xelil). Dawid Gören û Asiya Keso) kir. Birê Dawid ez jî vexwandibûme ser vê şahiya zarokên xwe.

Gava me berbûriyan hinek govend, reqs û dîlanên li ber sazband, def û zirnê kir pêve, me nanê xwe xwar û şûnde, êdî endamên dîwana komkirina xeltên bûk û zavê rûniştin. Dûre min dît birêz Dawid qîzeke 8-9 salî ku qîtika lingê wê hîna pêçayî bû jî anî li kêleka endamên dîwanê da runiştandin. Bi



dengê bilind lave ji pismam, zerî, heval û dostên xwe kir, ku heryekî li goriya mecalên xwe alîkariyê bi vê Asiya keça Keso ya ku di wextê komkujiya Şengalê de birîndar bubû re bike.

Ez rabûm çûme cem birê Dawid û min jê re got, bila bûk û zavê me li hevûdinê pîroz bin. Mala we gelekî ava be û ez bi vê dîplomasî û lobiya te û malbata te zahf kêf xweş bûm ku we weha di cîda alîkarî û piştgirî bi vê xuşka me ya ciwan re kir.

Hêvîdarim berpirsyarên, mal, komel, sazî, partî û ruhaniyên enedamê meclîsa Êzdiyan, hemû parlementer, qeymeqam û şaredarên Hukumeta Herêma Kurdistanê û nûnerên Neteweyên Yekbûyî jî bikaribin weha di cîde alîkarî bidine belengaz, birîndar û cangoriyên komkujiya Şengal, Şêxan û hemû deverên Kurdisatanê.

Ez îro dîsa serê xwe li ber keç, law, dê, bav û kalên me Kurdan, yên ku di bin destên zilm û zora padîşah, sultan, paşa, mîr, beg, walî, axa, jendirme, nijadperest, paşverû, hemû kevnepereştên Kurdistanê û berpirsyarên baylozخانên dewletên metîngehkar de hatine kuştin, ditewînim û dibêjim bila rahma Xwedê li ser hemû cangoriyên Kurd û Kurdisatanê be(<http://www.pen-kurd.org/kurdi/kemal-tolan/cagori-roj.html>).

Kemal Tolan
16.08.2008